Bajarê min	باژێرێ من
Bajarê min	باژێرێ من
Çend di bûrim	چەند د بوورم
li ser axa te ra	ل سەر ئاخا تە را
Li ser şax û çîya	ل سەر شاخ و چیا
Dol û gelîya	دول و گەلی یا
Di nav dilê axa te da	د ناڤ دلێ ئاخا تە دا
Qirrîn û gazî ne	قێرین و گازینە
Yêt ketîn dava evînê	یێت کەتین داڤا ئەڤینێ
Bê guneh û zerî ne	بێ گونەھ و زەرینە
Bi navê namûsê	ب ناڤێ نامیسێ
Hezar perî nivistîne	هزار پەری نڤیستینە
Bê nav û bê kêlî ne	بێ ناڤ و بێ کێلینە
Hezar jî	هزار ژی
Çaverêyê vî nifşî ne!	چاڤەرێیێ ڤی نفشینە
Ger xwedanên bajarê me	گەر خودانن باژێرێ مە
Seyêt har bin	سەێێت هار بن
Bê wefa û bê wijdan bin	بێ وەفا و بێ وژدان بن
Xwedan yasayeka	خودان یاسایەکا
Li ser ziman bin	ل سەر زمان بن
Ne bi emel û kirdar bin	نە ب ئەمل و کردار بن
Karê min û te	کارێ من و تە

Her girî û bêdengî ye	هەر گری و بێ دەنگی یە
Ji dîmenên	ژ دیمنن
Keziyên vehandî	گەزیێن ڤەهاندی
Wek bextekê reş	وەك بەختەكێ رەش
Li ser kiloxan mayî!	ل سەر كلۆخان مایی
****	****
Bajarê min	باژێرێ من
Şeydayên şevê	شەیدایێن شەڤێ
Şemalkên hêvîyê	شەمالكێن هیڤی یێ
Heldiken	هەل دكەن
Bi canê xwe	ب جانێ خۆ
Çend gurr dibin	چەند گور دبن
Semayek ji dil´e	سەمایەك ژ دلە
Dema me temirandin	دەما مە تەمراندن
Temrîna gunehên me ye	تەمرینا گونەهن مە یە
Dîyarîya hera ciwan	دیاریا هەرا جوان
Ji bo me	ژ بۆ مە
Mirinê pêşkêş diken	مرنێ پێشكێش دكەن
Bajarê min	باژێرێ من
Destarê min û te	دستارێ من و تە
Aşê kul û kovana ye	ئاشێ كول و كوڤانایە
Dihêrîn û hêrîn…	د هێرین و هێرین...

5.7.2009